# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :877 4-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165





## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ş | Ê | ■ | D | A | D | ■ | R | E |
| 2 | Î | ■ | Ş | ■ | D | U | Ş | E | M |
| 3 | ■ | H | Ê | J | A | ■ | A | Ş | ■ |
| 4 | D | ■ | T | O | R | I | N | ■ | K |
| 5 | E | Ç | ■ | V | ■ | L | O | R | Î |
| 6 | K | A | B | A | L | A | ■ | A | ■ |
| 7 | ■ | R | ■ | N | A | M | E | ■ | A |
| 8 | H | I | L | ■ | V | ■ | N | A | L |
| 9 | O | X | ■ | X | A | N | Î | ■ | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 2 | | ■ | | ■ | | | | | ■ |
| 3 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 6 | | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 8 | ■ | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | | | ■ | | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Notayek... Darê ku hikumdar, mirovên dînî wek sembola hêzê bi kar tînin
2. Lehengê destana Newrozê
3. Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê... Edalet... Yezdanekî misrî
4. Şaxên sebzeyên weke zebeş, petîx, kundir hwd. yên li ser erdê
5. Di şanoyê de mêrê weke jinê derdikeve ser dikê
6. Ji bo dem û zeman, nîveka destpêk û qedanê... Bêjinga dexlê ji hev diqetîne
7. Agir... Mîrîtiya ku paytexta wê Qeleçolan bû lê pişt re paytexta wê bûye Silêmanî
8. Baneşana kêfxweşiyê... Bajarekî me
9. Kurtkirina gotina televizyonê... Şivika darîn ya zirav ya serî tûj û bi kevan tê avêtin... Ji bo bûkê, birayê zavê

### JOR-JÊR

1. Bajarekî me... Peyva neyînî
2. Nexweşiyeke çermî
3. Wext, zeman
4. Encam, netîce... Nijada spî ya ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyda bûne; weke kesê ku bi erebî, ibranî, asûrî û hebeşî diaxivin
5. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji aliyê Xwedê ve hatiye tinekirin... Pirtûka pîroz ya ku tê bawerkirin ji Hz Dawid re hatiye şandin
6. Bi soranî 'av'... Kesê ku li ber aş dimîne û karê hêrana dike
7. Dijbera germ... Xwarina sereke
8. Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e... Notayek

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Ast** | **Pile, rade, derece, sewiye, hîza darax: Dema zimanek nebe zimanê bazarê asta wî dadikeve.** |
| **Dewre** (Erebî) | Beşeke diyarkirî ya zeman: Li saziyê dewreyeke perwerdeyê dest pê kir. |
| **Kurs** (Fransî) | Perwerdeya ji bo demeke diyar ku ji bo xurtkirina behre, jîrbûn û zanebûnê tê dayîn: Em diçin kursa zaravayê hewramî. |
| **Perwerde** | Karê fêrkirina kesekî, yan ajelekî. Perwerdeya dibistanan ya îsal baş bû. |
| **Pratîk** (Fransî) | 1. Tiştên ku bi hêsanî pêk tên. 2. Kesê karekî bi hêsanî û zû çareser dike. 3. Tersê teoriyê: Sozan pir didin lê di pratîkê de pêk naynin. |
| **Rêveberî** | 1. Karê birêvebirinê. Rêveberiya şaredariyê biryara erzankirina nan da. 2. Saziya birêvebirinê. |
| **Rêveber** | Kesê di rêveberiyê de ciyê xwe digire, kesên biryar di destê wan de. |
| **Rêbaz** | Awayê kirina karekî. Reng, şêwe, qeyde, şêwaz. Rêbaza karkirina wî baş e. |
| **Wane** | Demeke fêrbûn û fêrkirinê. Ders: Xwendekar dibêjin waneyên îsal zor bûn. |
| **Zanist** | Pisporî, şarezayî, zanyarî, zanîn, nasîn, ilim. Bijîşkî zanisteke pîroz e. |



## Li Mêrdînê şêwekarek bi qetranê wêneyan çêdike

**Wênesaz Nurettîn Çakmak li şûna boyaxê qetran ango qîrê bi kar tîne û wêneyên cuda çêdike.**

Wênesazê Kurd yê ji Mêrdînê Nûrettîn Çakmak wêneyên xweşik ji qetranên ango qîrê çêdike. Nêzî 18 salan e bi rêbazeke nû di wêneyên çêdike de li şûna boyaxê û pênûsrejiyê, qetranê bi kar tîne. Çakmak wêneyên hunermendên Kurd, pêşeng û şexsiyetên Kurd, cih û warên dîrokî yên Mêrdînê li ser caw neqiş dike. Çakmak li Mêrdîna qedîm kargehek vekiriye û karê xwe li wir bi rê ve dibe.

Çakmak bi wêneyên cuda balê dikişîne ser xwe û piştî hevalek wî qetran pêşniyaz kiriye wî jî bi qetranê dest bi çêkirina wêneyan kiriye. Çakmak niha tevayiya berhemên xwe bi vê rêbaza qîrê çêdike.

**XEBAT KÊF Û ILHAMÊ DIDIYÊ**

Çakmak behsa destpêka bikaranîna qetranê kir û got, destpêkê gelek zehmet bû lê niha hêsan bûye û ji qetranê wêneyên xweşiktir û balkêştir derdikevin holê. Çakmak da zanîn ku portre, rûyên insanan û mal, qesir, mizgeft, minare û dêrên dîrokî yên Mêrdînê bi wêneyên qetranê xweşiktir xwe radixin ber çavan. Çakmak da xuyakirin ku qetran reş e lê madeyeke din jî bi kar tîne û reng dide qetranê û bi van rengan wêneyan dixemilîne. Çakmak diyar kir ku girîngiyê dide kesayetên dîrokî, pêşengên kurd û neteweyên din û portreyên dengbêj Şakiro, Mele Mistafa Barzanî çêkiriye û niha jî li ser protreya hunermenda Kurd Eyşe Şan dixebite. Çakmak diyar kir ku kêfê ji xebata bi qetranê digire û ev xebat ilhamê didiyê.

*MA*

## Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser mozê-mêşa hingiv heye. Li hin herêmên Kurdistanê jê re dibêjin mor, li hin deveran jî dibêjin mêşhingiv. Moza hingiv, di dinyayê de tişta herî xweş ku hingiv e çêdike. Weke din di dinyayê de her xwarin xerab dibe lê hingiv xerab nabe. Du dijminên mozan-mêşhingiv hene; mozên sor û şehlûl. Taybetiyeke moza hingiv ew e ku pir dixebite û pispor e. Em binêrên ka sirûda me ya îro çawa ye.***

### MOZ-MÊŞA HINGIV

Moz im moza hingiv im
Bi vizviz û guvguv im

Bi tevger û livliv im
Şev û rojê nanivim

Tînim gul û gilyaza
Ji her nifşê gulnaza

Dikim fena gilwaza
Bi helbest û awaza

Gula dikim nan û şan
Hingiv dikim nava wan

Hundir dibe xanedan
Hingiv dibe qût û dan



Moz im mozek perzer im
Xwedî ked û huner im

Berhemê min derman e
Zindî dike terman e

## Gedo: Armanca ENKSê reşkirina Rêveberiya Xweser e



Sekreterê giştî yê Partiya Çep ya Demokratîk ya Sûriyê Salih Gedo daxuyaniyên ENKS`ê yên li dijî Rêveberiya Xweser wek "dijminane" bi nv kirin. Herwiha diyar kir ku armanca sereke ya wan daxuyaniyan reşkirina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ye.*R-4*

## Emerîka Tirkiye xist nava lîsteya welatên zarokan dikin leşker




Wezareta Karê Derve ya Emerîka Tirkiye xist nava lîsteya 'welatên zarokan wek leşker bi kar tîne. Bi vî awayî care yekê ye ku endameke NATO dikeve nava lîsteyê.*R-2*



# Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 877 4-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî




## "Zîlan şehîda xeta rûmetê"


Ji bo parastina çand û nasnameya xwe bi hezaran jinên Kurd, bi ruhekî fedayî têkoşîna azadiyê kirine û li ser xeta rûmetê şehîd bûne. Yek ji wan lehengan şehîd Zîlan (Zeyneb Kinacî) e, ku bi lehengiya xwe bû sembola jiyana azad.R-3

## "Heta kengê wê hêzên navneteweyî bêdeng bin?"




Enwer Mûslim derheqê êrişên tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûrî de axivî û got, armanca dewleta tirkî ya dagîrker diyar e; naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe. Ji ber wê her dem gefan li sînorê Sûriyê, bi taybetî herêmên bakur û rojhilatê Sûrî dixwe.R-5

## Divê li her deverê berxwedan û serhildan çêbin



Dewleta tirkî li ser rêber Abdullah Ocalan tecrîdeke giran dimeşîne û derfetê nade ku parêzer û malbata wî hevdîtinê pê re bikin. Têkildarî mijarê Endamê Yekîtiya Rewşenbîran ya herêma Cizîrê Ebûd Meqsû nêrînên xwe ji rojnameya me re rave kirin.R-5


## Dilê Min Dibîne



Komxwebatek bi navê "Dilê Min Dibîne" ji hêla kesên bidil (bê berdêl), ve ji bo kesên nabînin hat destpêkirin. Endamên komxebatê dan zanîn ku ji bo kesên nabînin pirtûkên cuda dublaj dikin û vî karî jî weke şahiyê dibînin.R-7

# "Banga Itîlafê banga bêrûmetiyê ye"

Serokê "Itîlafa Sûriyê" yê bi navê Nasir El-Herîrî, berî niha bi çend rojan li Stenbolê, di civîneke de bang li serokomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan kiribû ku herêmên Sûriyê yên din jî dagîr bike. Berdevkê fermî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwêş diyar kir ku "Itîlafa Sûriyê" li gorî berjewendiyên dewleta tirkî kar dike û got, banga "Itîlafê" banga bêrûmetiyê ye...R-4






**Neviyên Şêx Seîd** — Faruk SAKÎK — *R-5*

**Dema ku wijndan nebe** — Ednan Mustafa — *R-4*

**Rêgeza welatparêziyê** — Zehra TUNÇ — *R-3*

**Bila xêra miriyan be...!** — Sîpan Şînda — *R-7*

# Emerîka Tirkiye xist nava lîsteya welatên zarokan dikin leşker

**Wezareta Karê Derve ya Emerîka Tirkiye xist nava lîsteya 'welatên zarokan wek leşker bi kar tîne. Bi vî awayî care yekê ye ku endameke NATO dikeve nava lîsteyê.**




Li gorî nûçeya Reutersê, di rapora Bazirganiya Mirovî ya 2021'ê ya Wezareta Karê Derve ya Emerîka de, Tirkiye li Sûriyê çeteyên Sûltan Mûrad ji bo dijberiya Sûriyê ku Enqere demeke dirêj e destek dike, 'ji bo zarokên leşker destekeke eşkere' dide.
Rayedarekî Wezareta Karê Derve yê di asta jor de, diyar kir ku Washingtona ji bo çareserkirina pirsgirêkê hêviya xwe ya xebata bi Enqere re anî ziman û qala bikaranîna zarokan wek leşker li Libya kir.
Rayedarê Wezareta Karê Derve got, bi taybetî têkildarî Tirkiyê cara yekê ye ku endameke NATO di lîsteya çalakiya pêşîgirtina zarokan weke leşker de cih digire.
*ANHA*



## Rûsyayê vekirina dergehê Tilkoçer red kir

**Balyozê Rûsya yê li Neteweyên Yekbûyî pêşniyara jinûve vekirina dergehê Tilkoçer yê sînorî ji bo alîkariyên mirovî, wek "bêencam" bi nav kir.**

Li gorî ajansa Associated Press, projeya biryarê ya Meclisa EwleYiyê ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî (NY) pêşniyar kir ku alîkariyan di dergehê TilKoçer û Bab El-Hewa re bişînin: Lêbelê balyozê Rûsya yê li NY Vasily Nebenzia di civîneke çapmeniyê de diyar kir ku Rûsya wê nîqaş bike, ka dikarin xebata radestkirina alîkariyê di deriyê Bab El-Hewa re bidomînin yan na.
Vasily Nebenzia pêşniyara jinûve vekirina dergehê Tilkoçer yê sînorî ji bo alîkariya mirovî jî wek "bêencam" bi nav kir.
*ANHA*

## MÎTa Tirkiyê û çeteyên wê 5 efrînî revandin



**Istixbarata dewleta tirkî û çeteyên wê 5 kesên ji kantona Efrînê ya dagîrkirî revandin û ji bo berdana wan pereyên zêde xwestin.**

Artêşa tirkî ya dagîrker revandina welatiyên kantona Efrînê ya dagîrkirî didomîne. Di nava çend rojên dawî de 5 welatiyên ji Efrînê hatin revandin.
Çeteyên bi navê Polîsên Leşkerî 29`ê Hezîrana borî welatiyê bi navê Mihemed Reşo (35) yê ji gundê Derwêş yê girêdayî navçeya Şera ji navenda bajarê Efrînê revandin û ber bi cihekî ne diyar ve birin.
Çavkaniyan ji navçeya Raco ya girêdayî Efrînê ragihand ku çeteyên Firqêt El-Hemzat du kalepîr ji gundê Goliya jêrî revandin û ber bi cihekî ne diyar ve birin. Herwiha ji bo berdana wan pere xwestine.
Heman çavkaniyê diyar kir ku navên her du kalepîran wiha ne: Xelîl Îbrahîm Bîlal (65) û Mistefa Mihemed Yûsif (60).
Çavkaniyê da zanîn ku çeteyên El-Hemzat berî niha jî welatiyê bi navê Elî Mihemed Arif ji heman gundî revandin û di nava 10 rojan de gelek cureyên qirêj yên işkenceyê pê kirin.
Çavkaniyê got komên çete beramberî berdana kesên hatîn revandin pereyên zêde xwestine.
Çavkaniyeke din da zanîn ku istixbarata Tirkiyê 28`ê Hezîrana borî parêzer Reşîd Kekeç Mihemed yê ji gundê Qizilbaşa yê girêdayî navçeya Bilbilê ya Efrînê, revandin.
Li gorî çavkaniyê, kesê bi navê Reşîd Kekeç Mihemed "qaşo" endamê Weqfa Kurdên Serbixwe ku ji aliyê dewleta Tirk ve, bi serkêşiya çeteyê bi navê Ebdulezîz Temo, hatiye avakirin e.
Li gorî çavkaniyê sedema revandina Reşîd Kekeç Mihemed nayê zanîn.
*ANHA*



## SOHR`ê encama meha Hezîranê eşkere kir



**Hêzên hikumeta Şamê û çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker, li gundewarê Helebê bi hev ketin. Herwiha Navenda Çavdêriyê ya Mafê Mirovan ya Sûriyê jimara kuştiyên meha Hezîranê belge kir.**

Navenda Çavdêriyê ya Mafê Mirovan ya Sûriyê (SOHR) ragihand ku hêzên hikumeta Şamê û çeteyên dewleta tirkî bi çekên giran li derdora Eyn Deqnê ya gundewarê bakurê Helebê bi hev ketin. Di encamê de endamekî hêzên hikumeta Şamê birîndar bû.
Ji aliyekî din ve SOHR'ê ragihand ku 255 kes di meha Hezîrana sala 2021'ê de hatine kuştin û detayên kesên hatîn kuştin wiha ne:
- 97 sivîl, ji wan 22 zarok ku temenê wan kêmtirî 18 salan e, 14 welatiyên jin û hemû di teqîn, işkence û topbaranê de hatine kuştin.
- 158 endamên hêzên hikumeta Şamê û komên çekdar yên alîgirên wan û çeteyên DAIŞ'ê û hêzên dewleta tirkî û çeteyên wê hatine kuştin.
*ANHA*

## CPT sûcên artêşa tirkî yên li Başûr kirin rapor

**CPT têkildarî sûcên artêşa tirkî ya dagîrker yên derbarê xwezaya başûrê Kurdistanê de daxuyanî da û got, em ji artêşa tirkî dixwazin êrişên xwe yên li ser başûrê Kurdistanê rawestîne û êdî şêniyên gundan nekin hedef. Herwiha zevî û daran neşewitînin.**

Rêxistina Christian Peacemaker Teams (Tîma Aştîxwaz ya Xiristiyan-CPT) li ser rewşa gundên li ser sînorê herêma Behdîna raporek belav kir û diyar kir ku leşkerên Tirk bi şev derbasî nava gundan dibin, agir bi rez û baxên welatiyan dixin.
**Di rapora CPT'ê de wiha hat gotin:**
"Tevî bombebarana zevî û xaniyên welatiyan, bi şev leşkerên Tirk dikevin nava gundan û agir bi zevî û darên welatiyan dixin.
Ji dema ku êrişa Tirkiyê ji 23'yê Nîsanê ve dest pê kirî ve, zêdetirî 10 hezar donim zeviyên çandiniyê ji ber bombebarana Tirkiyê li devera Berwarî Bala ya li Kurdistana Iraqê şewitîne. Tîma CPT tevayiya kavilkariya ku di encama êrişên artêşa tirkî de çêbûne, li deverê belge kirin. Bi taybetî jî êrişên ser gundê Hirorê ku di vê dawiyê de tîma me serdana wê deverê kir.
Di dema serdanê de welatiyek ji gundê Hiror ji tîma CPT re got, piraniya zeviyên me yên çandiniyê di encama bombebaranên balafir û helîkopterên Tirkiye de şewitîne. Di hin şevan de qet dengê bombebaran û guleyan nabihîzin, lê em dengê leşkerên Tirk dibihîsin ku xwe di berdidinn nava gund zevî û darên me dişewitînin.'
Heman kesî diyar kir ku leşkerên Tirk ji wan re gotine, nabe ji bo avdan û karkirinê hûn biçin ser zeviyên xwe, eger hûn biçin emê wek gerîla bihesibînin û we bombebaran bikin.
Li ser wêrankariya di bombebaranê de li devera Berwarî Bala çêbûyî jî Rêveberê bajarokê Kanîmasî Serbest Sebrî ji tîma CPT re wiha axivî: "Temenê hinek darên şewitîn zêdetirî 100 salî ye. Tişta li vir diqewime karesateke xwezayî ye. Ji civaka Navneteweyî dixwazim li hemberî van sûcên artêşa tirkî bêdeng nemînin.
Wek CPT em em ji artêşa tirkî dixwazin êrişên xwe yên li ser başûrê Kurdistanê rawestîne û êdî şêniyên gundan nekin hedef. Herwiha zevî û daran neşewitînin."
*ANHA*





# Li Rojava şoreşa perwerdeyê -xelek 3-

Ev roportaja li jêrê ji aliyê rojnameya XWEBÛN ve bi berpirsên Zanîngeha Kobanê re hatiye çêkirin)
Îro dilê Kurdan tevan bi Şoreşa Rojava re lê dixe û dengê wan ji bo Rojava bilind dibe. Pêvajoya şoreşê pêvajoya afrîneriyê ye. Ji jiyana şkestî û nîvco, ji kavilan, ji wêranxaneyan û ji bermayiyên tofanê mirov jiyan û cîhaneke nû hildiberînin. Li Rojava jiyan pêş dikeve, cîhan tê bilindkirin. Me jî xwest em di çarçoveya Şoreşa Rojava de dêhn û bala xwe bidin perwerdeya li Rojava pêş dikeve. Ji bo wê emê pêşiyê guh bidin pêşeng, dahêner û mamosteyên pergala perwerdeyê ya Rojava. Mamosteyên Zanîngeha Kobanê wê ji me re behsa Zanîngeha Kobanê bikin. Mamoste Şervan Muslim ku Endamê Desteya Rêveber ya Zanîngeha Kobanê ye û mamoste Egîd Nasro ku Hevserokê Fakûlteya Wêje û Zimanê kurdî ye wê bibin mêvanên hevpeyvîna me. Ji bo alîkarî û piştgiriya Berpirsa Odeya Têkiliyên Derve Xunav Îsa jî em spasiyên xwe dikin.



**Her kes dizane ku we pergala xwe ya perwerdeyê ne ku piştî şoreşê, di heyameke wisa de de saz kir ku şoreşê hê jî berdewam dikir. Ev jî aliyekî serkeftî yê Şoreşa Rojava bû. Pirsa min jî ev e: "Di destpêkê de, nexasim di mijara damezirandina zanîngehan de hûn bi pirsgirêkên çawa re rû bi rû man?"**

Ş.M: Bê guman di meseleya zor û zehmetiyan de em bi xwe pêrgî gelek tiştinan hatin. Ne tiştekî hêsan e tu pergaleke perwerdeyê ji destpêkê heta asta zanîngehê bidî rûniştandin. Hem di aliyê pîşeyî de hem di aliyê pisporî û akademîk de kar û xebateke pir mezin jê re divê. Heta zanîngehek bê avakirin pêwîstî bi alav û amûrên wê yên labaratuarî, peydakirina mamosteyên pispor û di warê akademîk de heye û her wiha şert û mercên wê yên cografîk jî roleke pirr girîng dileyîzin. Em jî her tim bi awayekî rû bi rû rastî şerekî dihatin, êrîşên dewleta tirk her tim li ber serê me bû. Me di şert û mercên bi vî rengî de zanîngeh dane avakirin. Lê belê pirsgirêka me ya herî berbiçav peydakirina kadroyên akademîk bû. Piştî ku şer destpê kir mixabin beşekî girîng ên kadroyên akademîk derketin derveyî welat û beşek jî li welat ma. Derketina derveyî welat ji bo piraniyan, ne ji neçariyê bû yanî dikarîbûn li welat bimînin û tev li karê şoreşê bibin. Ev jî girêdayî cewherê welatparêziyê ye bêguman.
Digel van yekan jî peydakirina cihên ku dê bibin zanîngeh jî pirsgirêk bû. Lewra heke em behsa Kobanê bikin, Kobanê bajarekî wisa bû ku bi temamî hatibû rûxandin. Ew avahiyên wê yên mezin yên ji bo zanîngehê guncaw bûn nehatin peydakirin. Ji ber vê yekê em rastî astengiyan hatin. Lê niha piştî 4 salan em gihîştine wê astê ku şagirdên me dê bikaribin derbiçin. Ev bi xwe li cem me cihê şanazî û kêfxweşiyê ye.
Cihê ku niha me ji bo zanîngehê eyar kiriye belkî ne li gorî pîvanên navneteweyî bin lê me li gorî derfetên xwe ew cih eyar kiriye û em kar û xebatên xwe tê de berdewam dikin. Her wiha niha ji bo wan kadroyên akademîk yên ku dersan didin pîvanên me jî hene. Kesên ku lîsans qedandine, master kirine û doktora kirine hem ji nav welat hem jî ji derveyî welat CVyên xwe ji bo me bi rê dikin û em van yekan dinirxînin. Bi vî awayî em hêdî hêdî bingeha zanîngeha xwe xurt dikin. Di salên bê de em ê 8 beşên nû li bin sîwana zanîngeha xwe zêde bikin.



**Dema ez lê dinihêrim di nav mamosteyên zanîngehên Rojava de gelek mamosteyên ciwan hene. Gelo sedemê vê yekê çi ne? Gelo hûn mamosteyên xwe bi xwe hildibijêrin? Li gorî kîjan xalan hildibijêrin? Gelo hê jî pêdiviya we bi mamosteyan heye an na?**

E.N: Niha li ser asta Rojava bi giştî tevahiya mamosteyan ne ciwan in. Belkî ev yek bi tenê ji bo zanîngeha Kobanê derbasdar e. Di vê mijarê de belkî ferq û sedemine cudatir hebin. Lewra li vir û heta li derine din jî zanîngehên ku mamosteyên kurdî jê derbiçin pirr kêm in. Belkî jî tenê li başûrê Kurdistanê ev yek heye. Lê derfetên ku ji me re bibin alîkar û em bikaribin pê mamosteyên ku dê bikaribin bên li vir ders bidin peyda bikin bi dest me neketin. Ev 8 salên şoreşê ne. Ev dibe sedem ku di vî milî de peydakirina mamosteyên ciwan zehmet be. Lewra di vê pêvajoyê de mamosteyên ku lêkolîn û lêgerînên li ser zimanê kurdî wekî erkekî danîbin pêş xwe û xebatên xwe bikin xwedî wan derfetan nebûn. Zehmet bû ku di nav şoreşê de bikaribin zanîngehekê ava bikin û dersên zimanê kurdî, wêjeya kurdî di nav pergalekê de pêşkêş bikin. Belkî ev yek heta radeyekê li Zanîngeha Rojava pêk hat. Ev dikeve sala 2'yan ku şagird dê li wir derbiçin. Li Zanîngeha Kobanê jî îsal em amadehiya vê yekê dikin. Vêya hişt ku di asta xweperwerdekirinê de hinekî bêhtir ciwan derkevin pêş û em wan bigirin nav pergala perwerdeya zanîngehê. Lê ne ji bo ciwanan tenê, her wiha, berê kesên ku bi dizî xwe fêrî zimanê kurdî kiribûn jî di vê pêvajoyê de ketin nav hewldanên bi vî rengî.
Şert û mercên me yên girtina mamosteyan jî li gorî şert û merc û pîvanên zanîngehên cîhanê ne. Niha kesên ku divê li zanîngehan ders bidin lazim e doktoraya xwe kiribin. Eger ev hebe jixwe di destpêkê de ev pile tê qebûlkirin. Eger pile bi dest neket li gorî pêwîstiyên me û yên herêmê jî em hin tiştan li ber çavan re derbas dikin û bi vî awayî kesinan qebûl dikin. Ango ku ev pileya doktorayê bi dest neket di pileyeke din de biryara qebûlkirinê tê dayîn. Di asta master û lîsansê de jî kesên ku bi rastî jî bikaribin ji vî karî re bibin bersiv, li gorî pîvanên ku zanîngehê ji xwe re danîne ew jî dikarin bên hilbijartin û pejirandin. Digel vê yekê kesên ku bi salan e li ser kurdî xebitîne, ked dane û serê xwe êşandine jî li gorî pêdiviyan dikarin berpirsiyariya vî karî bigirin ser xwe.







## Bila xêra miriyan be...!

Sîpan Şînda

Her civak, her netewe, çandek urf û edetên cuda hene. Şiklê jiyana civakan li gorî urf û edetên wan, exlaq, rêz rismên wan qalibê xwe digire. Ev qalibên jiyana civakî jî di nava demê de li gorî şert û mercan xwe diguherînin û nêrînên nû derdikevin pêş. Lêbelê ev guhertin di nava tevayiya civakan de ne wekî hev e. Hinek tişt jî hene nayên guhertin yan jî guhertina wan ewqas hêdîka ye ku sed sal, hezar sal ser re diçin û jixwe mirov lê nayne der jî.
Yek ji van edetên nayên guhertin yan ji gelek hêdî tên guhertin edetê civakê yê derbarê miriyan de ye; ango têkiliya di navbera zindî û miriyan de ye. Heta ku mirov dijî mirov endamekî civakê ye. Lê gelo piştî mirov dimire çi dibe? Ma gelo hema heçî mir têkiliya wan û heskiriyên wan ango civaka wan ji binî qut dibe û diçe? Na. Belê bi awayekî fîzîkî rast e, lêbelê bi awayekî manewî ew têkilî bi cureyên cuda dom dike. Ji ber ku di nava pirrê civakan de baweriya piştî mirinê jiyaneke din jî heye û li gorî gelek ol û baweriyan wê ew li dinyayeke din bigihên hev. Lewra xwediyên miriyan bawer dikin ku wê giyanê miriyên wan rojekê bigihên hev û dîsa bi hev re bijîn. Gelo ev têkiliya di navbera mirî û zindiyan de çawa tê danîn yan jî didome? Em hemû jî piştî heskiriyên xwe xemgîn dibin, diçilmisin, demekê jiyan li ber çavên me reş dibe, em hiznê digirin. Ji ber wê em her tim heskiriyên xwe yên ji ber çavên me çûyîn bîr tînin. Yanê em naxwazin em wan ji bîr bikin û em têkiliya xwe bi wan re didomînin. Em diçin li ser gora heskiriyên xwe, li ber serê wan rûdinin, ji wan re li gorî baweriya xwe dia dikin, xêra ji wan re dikin, li ser gora wan gul û nêrgizan diçînin, fathe û yasînan ji wan redixwînin û "dewrî" wan dikin… Belê zindî gelek tiştan dikin ji bo têkiliya xwe ji miriyên xwe qut nekin. Yek ji van têkiliyên xurt jê "xêr"a ji bo miriyan e. Baş tê bîra min, dema ez zarok rehmetiya pîrika min her êvara Înê "şîva miriyan" dida min û digot here bibe ji filan malê re û bêje "şîva miriyan" e. Dibe ku ev niha kêm bûbbe, lêbelê niha jî di nava civakê de "şîva miriyan" carekê himber rojên salê tê dayîn. Di nava civaka me de gelek kes êvara Înê diçin ser gora miriyên xwe û ji wan re Quranê dixwînin. Hingî rojên cejna Remezanê û ya cejna Haciyan serê sibê xelk pêşiyê diçin ser gora miriyên xwe, ji wan re fatiheyan dixwînin û cejna wan pîroz dikin. Dema xêrekê bidin feqîrekê û jarekê jî dibêjin "bila xêra miriyan be." Şikleke din yê têkiliya di navbera zindî û miriyan de bi riya xewnê tê danîn. Mirov di jiyana xwe de gelek caran miriyên xwe di xewna xwe de dibînin û piştî wê jî ji bo xatirê wan xêr û xêratan didin. Belê bîranînên ji bo şehîdan tên kirin jî şiklek yê têkiliyê ye.
Ev hemû têkiliyên xurt di navbera zindî û miriyan de çêdikin û manewiyateke gelek xurt jî di nava civakê de ava dike. Gelek tiştên din jî hene ku mirov bêje ji ber ku ev mijarên ha di warê civaknasiyê de gelek girîng in û derbarê qerekterê civakan de agahiyên girîng didin mirovî.

# Dilê Min Dibîne

**Komxwebatek bi navê "Dilê Min Dibîne" ji hêla kesên bidil (bê berdêl) ve, jibo kesên nabînin hat destpêkirin. Endamên komxebatê dan zanîn ku ji bo kesên nabînin pirtûkên cuda dublaj dikin û vî karî jî weke şahiyê dibînin.**

**Lêzan EVDIKÊ/Qamişlo**

Komxebata "Dilê Min Dibîne"ku ji komek rojnamevan, heskiriyên pirtûkan û yên pirtûkan dublaj dikin pêk hatiye, berî du mehan dest pê kiriye û serbixwe ye.

**"WÊ CIVAKA ME BI ENERJIYA CIWANAN PÊŞ BIKEVE"**

Kordînatorê Giştî yê komxebatê Raman Hesê diyar kir ku dema vê xebatê wê li gorî projeyên wan diyar bibe û projeyeke wan ya dublajkirina pirtûkan li peymangeha Kobanê ji bo zarokên ji çavên xwe astengdar amade dikin. Herwiha da zanîn ku vê projeyê berî du mehan dest pê kiriye û heta serê salê vê bidome. Armanca komxebatê ew e ku bi riya dengê xwe bibin çavên kesên astengdar. Destpêka xebatê li gorî kesên temenê wan ser 18an re bû. Pirtûkên wêjeyî, analîz, felsefe hwd. dublaj dikirin. Lê li gorî daxwaziyan, ji bo zarokên temenê wan di navbera 6 û 12an de dest bi dublaja pirtûkan kirine. Raman da zanin di komxabatê de 36 kes hene û axaftina xwe wiha domand: " Piraniya kesên



di komxabatê de rojnemevan in. Cara yekê ye ku li Rojava xebateke wiha tê kirin. Ji bo wê jî hêviya me bi serkeftina vê projeyê heye ku xwe bigihîne civakê. Pêdiviya civaka me bi enerjiya ciwanan heye. Me gelek piştgirî û spasî li ser medyaya civakî dît û vê hişt ku em pirtir dilgerm bibin û bixebitin."

**"EMÊ BIBIN ÇAVÊN WAN"**

Helbestvan, nûçegihan û xebatkara komxabatê Meryem Temer jî li ser vê xebatê wiha axivî: Ez tevlî vê xebatê bûm ku herî kêm ez jî bi dengê xwe bibim çavên kesên astengdar. Ez dibînim ku bi vê xebatê em dikarin çanda alîkarî û heskirinê di nava civaka xwe de xurt bikin. Dema ez tevlî



vê xebatê bûm û min deng tomar dikir, min his kir ku ez mirovekî din temam dikim. Ez hêvî dikim ku komxebata me bidomîne, rojbiroj pêş keve û deng bide heta ku em şiyariya civakê xurt bikin.

# "Kilînkên gel bûne hêviya xizanan"

**Şivan Xelîl / Qamişlo**

**Ji bo pêkanîna pêdiviyên tenduristiya gel, ji aliye Rêveberiya Xweser ve 28ê Adarê li Qamişlo 9 Kilînîkên Gel hatin vekirin. Şiyar Şerîf diyar kir ku gel bi xizmeta van kilînîkan keyfxweş e.**



Dermanfiroş Şiyar Şerîf ku dermanxaneya klînîkan de dixebite derbarê kilînîkên gel de, herwiha xizmeta ku ji gel re tê pêşkêşkirin ji rojnameya me re nirxand û wiha got: "Karê me yê dermanxaneyê ji saet 08:00`an heta 14:00`an vekirî ne. Em 3 kes di dermanxaneyê de dixebitin. Ji sedî 80 derman li cem me peyda dibin, lê hin derman nayên peydakirin. Sedema wê rejima Sûriyê ye. Lewra ev 4 meh in dergehên bi herêmên Rêveberiya Xweser re girtine. Ji bo wê hatina derman; weke dermanê nexweşiyên giran mîna dil, çav û zextê hatiye qutkirin."

Şiyar da zanin ku di peydakirina dermanan de rêxistinên civaka sivîl, Heyva Sor, Nexweşxaneya Dil û Çav û sendîkaya bijîşkan alîkariya wa dikin.

Têkildarî bihayê dermanên li kilînkên gel jî Şiyar Şerîf wiha got: "Di navbera kilînên gel û dermanxeyên derve de ji sedî ji 10 heta 15`an ferq heye. Lênerîna bijîşkan jî 3 hezar lîreyên Sûrî ye, lê li derve 10 hezar in. Herwiha tehlîl û bijîşkên diranan bi bihayê pir kêm dixebitin. Niha beşa eşîa jî tê amadekirin û di nava du heftiyan de wê were vekirin."

Şiyar Şerîf diyar kir ku serlêdana gel ya Kilînkên Gel zêde çêdibe û gel ji pêşwaziya van kilînikan razî ye û gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Gel bi awayekî baş berê xwe dide kilînkan. Lewra ne demeke dirêj e ku Kilînîkên Gel hatine vekirin û hêdî hêdî serlêdana wan zêde dibe. Em bang li rêxistinên navneteweyî dikin ku di peydakirina dermanan de alîkariya me



bikin. Herwiha em spasiya UNICEF dikin ku hin cureyên dermanan ji me re peyda kirin."

Herwiha welatiya bi navê Emanî Mihemed ku berê wê li kilînkên gel bû wiha got: "Ez diçûm gel bijîşkên derve, lê pir biha bûn. Ji ber wê ez hatim klînkên gel. Lewra alîkariya xizanan dikin û bi awayekî baş li nexweşan dinêrin."

# Li Hesekê û Girkê Legê projeyên xizmetgûzariyê

**Şaredariya gel ya Hesekê û navçeya Girkê Legê, di nava plana îsal de, amadekariya projeyên nû yên xizmetgûzariyê dikin.**

Şaredariyên gel yên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, hewl didin xebata xizmetgêzariyê li herêmê li gorî budçeya sala 2021'ê baştir bikin.

Şaredariya Gel ya Hesekê, ji 20 Hezîranê ve dest bi projeya sererastkirina riyan kiriye.

Hevseroka Şaredariya Gel ya Hesekê Viyan Çaçan diyar kir ku armanca wan projeyan ew e ku binesaziya bajêr baştir bikin, bi taybetî piştî zêdebûna avayiyan. Viyan da zanîn ku proje tev ji hêla Şaredariya Gel pêk tîn û got, proje bi miqdarê 150 hezar dolar e ango 400 mîlyon lîreyên Sûriyê.

**GIRÊ LEGÊ**

Li navçeya Girkê Legê, Şaredariya Gel 64 hezar dolar veqetandin da ku li navenda navçeyê û bajarokên wê plansaziyên xwe yên xizmetgûzariyê pêk bîne.

Di nava projeyên xizmetgûzariyê de, avakirina geracekê li navçeya Girkê Legê bi bihayê 9 hezar dolar û kolana bîrekê li herêma bakurê



Girkê Legê.

Herwiha sererastkirina rê û kolanên navçeyê û vekirin û sererastkirina toreyên kanalîzasyonê bi miqdarê 10 hezar dolarî.

Li gorî çavdêrên Şaredariya Gel, wê riya bajarokê Mistefawiyê û riya gundê Yûsifiyê werin sererastkirin.

Herwiha toreyên kanalîzasyonê yên gundên Rimêlan Paşa û Erûr jî werin nûkirin.

***ANHA***

# "Pêwîstî bi beşeke din ya vaksînê heye"

**Navanda Nûçeyan/Qamişlo**

**23 hezar derziyên li dijî vîrûsa korona (Covid-19) bi riya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê ji herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê re hatin şandin.**

Vîrûsa Korona li cîhanê xetereke mezin çêkir û çêdike. Ji destpêka derketina nexweşiyê heta niha li seranserê cîhanê, bi dehhezaran mirovan jiyana xwe ji dest daye. Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê jî ji ber vê newxeşîyê bi sedan mirov mirin.

Piştî xebateke zêde ya Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo bidestxistina dermanên li dijî vîrûsa Korona, bi riya RêxistinaTenduristiyê ya Cîhanê, 23 hezar derziyên li dijî vîrûsa korona( Covid-19) ji herêmên bakur û rojhilarê Sûriyê re hatin şandin.

Têkîldarî mijarê berdevka Komîteya Tenduristiyê ya kantona Qamişlo Rojîn Ehmed, da zanîn ku ji bo pêşîgirtina li nexweşiyê, ji despêkê heta niha hewldanên wan pir çêbûne û wiha got: "Despêka derketina Covid-19 ji bo pêşîgirtina li belavbûna nexweşiyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, hewldanên Desteya Tenduristiyê hebûn. Wê demê me gelek tedbîr standin. Navend û saziyên li herêmê tev hatin dermankirin û li ser xweparastina ji nexweşiyê gelek semîner hatin dayîn. Lê ji ber ku sînorê navbera me û rêjimê nahat girtin, nexweşî li herêmên me jî belav bû û ji binê kontrolê derket. Wê demê gelek kes pê ketin. Rojbiroj jimara nexweşan zêde dibû û mirin jî çêdibû. Ji bo wê me hin navendên xweparastina ji nexweşiyê vekirin û biryara qedexeya çûnhatinê da. Tevî kêmbûna derfetan, heta asteke baş navend ji nexweşiyê re bûn bersiv. Çar navendên Covîd-19 li herêma Cizîrê hene û ya herî dawî li Qamişlo hat vekirin. Ev navend xizmeta nexweşan dikin û tenduristiya wan diparêzin."

Rojîn diyar kir ku jimara nexweşên korona niha kêm bûye û axaftina xwe wiha domand: "Niha ji ber ku havîn e û germ zêde ye, jimara nexweşan kêm bûye. Lê bi demê



re vîrûs xwe diguherîne û her carê ji ya berê bixetertir e. Dema bê jî wê pêla sisyan derkeve û wê ji her du pêlên pêşî girantir be. Ji bo wê, hem di milê teknîkî hem di peydakirina dermanan de emê tedbîrên baş bigirin. Dibe ku di dema bê de em biryara qedexeyê jî bidin. Çimkî di çûnhatinê de, li holên dawetan û konê sersaxiyê nexweşî pirtir belav dibe. Ji bo wê jî pêwîstî bi qedexeyê heye."

Rojîn Ehmed li ser têkîliyên Desteya Tenduristiyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi rêxistinên tenduristiyê yên cîhanê ev agahî dan: "Têvî ku Desteya Tendûristiyê têkîliyên xwe bi rêxistinên tenduristiyê yên derve re dike, mixabin heta niha ji bo gelê bakur û rojhilatê Sûriyê tiştek nekirine. Lê dema dawî bi riya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê 23ê hezar derziyên vaksîn yên li dijî vîrûsa korona ji herêmên bakur û rojhilatê sûriyê re hatin şandin. Ev derzî encama wan erênî ye û ti zerera wan nîne. Derzî ji kesên temenmezin û nexweşên giran re weke dil û şekir- hatin dayîn. Ji bo ku nexweşî nemîne û xetera wê li ser mirovan kêm bibe, wê dema pêş ji her kesî re derziya vaksîn werin standin.

Berdevka Komîteya Tenduristiyê ya kantona Qamişlo Rojîn Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Wek Desteya Tenduristiyê ji bo parastina tenduristiya gelê xwe, me ked da heta ku 23 hezar derzî ji herêmê re hatin şandin. Jimara derziyên hatîn şandin kêm in û pêwîstiya herêmê bi derziyan heye. Ji ber wê em bang li rêxistinên navneteweyî dikin ku dema pêş beşeke din ya derziyan ji herêmên bakur û rojhilatê sûriyê re bişînin. Lê ne derziyên vaksîn tenê, dermanên din jî ji herêmê re pêwîst in."



# "Zîlan şehîda xeta rûmetê"

**Ji bo parastina çand û nasnameya xwe bi hezaran jinên Kurd, bi ruhekî fedayî têkoşîna azadiyê kirine û li ser xeta rûmetê şehîd bûne. Yek ji wan lehengan şehîd Zîlan (Zeyneb Kinacî) e, ku bi lehengiya xwe bû sembola jiyana azad.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Şehîd Zîlan sala 1972yan li bakurê Kurdistanê li gundê Almalî yê bajarê Meletî ji dayîk bûye. Zîlan beşa zanista derûnî ya zanîngeha Înonû qedandiye. Piştî wê tevlî Tevgera Rizgariya Kurdistanê dibe. Demeke kurt di nava tevgerê de xebatê dike û 30yê Hezîrana 1996an li dijî êrişên dewleta tirkî yên hovane yên li ser gelê kurd û hedefkirina Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan, li Dêrsimê çalakiyeke fedayî pêk tîne. Di vê çalakiyê de artêşa tirkî windayiyên pir mezin dide. Li hemberê taktik û hêza jina Kurd ya têkoşer matmayî dimîne û dikeve nava şokê.

Derbarê mijarê de rêvebera Kongreya Star ya Qada Civakî ya Qamişlo Hediya Ebdo, da zanin ku şehîd Zîlan bi canfedayîtiya xwe navê xwe di dîrokê de xêz kir û wiha got: "Em di kesayeta şehîd Zîlan de tevayiya şehîdên tevgera azadiyê bîr tînin. Bi şehadeta Zîlan re bi hezaran Zîlan ketin şûna wê, têkoşîn kirin û berxwedana wê



domandin. Dengê berxwedana Zîlan li seranserê dinyayê belav bû û bi hezaran jin li ser xeta wê dijîn. Şehîd Zîlan mîraseke bi têkoşîn û berxwedanê dagirtî li dû xwe hişt. Herwiha hişmendiya mêran şkand û berxwedana jina azad isbat kir. Gotineke şehîd Zîlan heye dibêje, `Serokê min eger ji canê min bihatir hebûya minê feda bikira, lê ji canê min bihatir nîne. Ji ber wê ezê canê xwe feda bikim.` Ev gotina wê cihê rêzgirtinê ye û diyar dike ka çiqas jineke welatparêz û girêdayî xaka xwe ye."

**"Hişyar bin xwe û xaka xwe nexapînin!"**

Hediya got, jinên me yên şoreşger



li çiyayên azad berxwedanê dikin, PDK jî li dijî vê berxwedanê şer dike. Herwiha di berdewamiya axiftina xwe de wiha got: "PDK bi dijmin re êrişî xeta Zîlan dike. Ji bo wê em ji PDKê re dibêjin li xwe vegerin û destekê nedin dijminê xwe. Çimkî ev dijmin şerê hebûna we dike. Li şûna hûn destek bidin dijmin li yêkîtiya xwe bigerin û tevlî xeta Zîlanan bibin. Ev dijminê me Kurdan tevan e, hişyar bin xwe û xaka xwe nexapînin."

**"Çima PDK dijmin qebûl dike û biratiya me qebûl nake?!"**

Hediya Ebdo bang li dayîkên pêşmergeyan kir û got, zarokên xwe ji xeta şaş vegerînin û axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Em hurmetê didin dayîkên gerîla û pêşmergeyan jî. Lê em ji dayîkên pêşmergeyan re dibîjin, bila zarokên we werin ser xeta rast û rûmetê xeta Zîlanan. Ev dem dema azadiya me Kurdan e, dema yêkîtiya Kurdan e. Çima PDK dijmin qebûl dike û biratiya me qebûl nake. Em dibêjin ji xiyanetê re êdî bes e. Banga me ji gelê başûrê Kurdistanê re ew e ku destekê bidin gerîlayên me û wekheviyê bikin."

# PYD: Bi girtin û kuştinê pirsgirêk çareser nabin

**Dilîn EHMED/Qamişlo**

**24 roj di ser girtina nûnerên Rêveberiya Xweser û endamên PYD`ê re ku ji aliyê hêzên PDK'ê ve hatine girtin, derbas dibin. Derbarê mijarê de Rohat Mele Xelîl diyar kir ku, bi girtin, kuştin û şerê navxweyî pirsgirêkên Kurdan çareser nabin.**

10'ê Hezîranê nûnerê Rêveberiya Xweser yê li Hewlêrê Cîhad Hesen û du endamên PYDê Mistefa Ezîz û Mistefa Osman Xelîl ku ji bo pêşwazîkirina mêvanan diçûn balafirgeha Hewlêrê, ji aliyê hêzên PDK`ê ve hatin girtin. Tevî ku Rêveberiya Xweser û PYDê bang li hikumeta herêma Başûr kirine ku çarenûsa girtiyan diyar bike, lê heta niha derbarê girtiyan de ti agahiyên zelal nehatine.

Hevseroka Ofîsa Têkiliyên Doblomasiyê ya PYD`ê Rohat Mele Xelîl, derheqê mijarê de ji me re axivî.

**"Rê li pêşiya yekîtiya neteweyî digirin"**

Rohat Xelîl diyar kir ku, di




rewşekê de ku endamên wan û nûnerên rêveberiyê ji bo avakirina yekîtiya kurdî dixebitîn, girtina wan dikeve xizmeta dijmin. Rohat axftina xwe wiha domand: "Girtina endam û nûneran li Başûr, diyar dike ku naxwezin yekîtî were avakirin. Bêguman ev dikeve xizmeta dijminê gelê Kurd û rewakirina êrişên ser Başûr. Ev bûyerên bi vî rengî nîşan didin ku, çi kesê ji bo azadiya gelê Kurd bixebite wê rastî êrişan were. Ti sedem nînin ku hevalên me bi vî rengî werin girtin, wan karê xwe bi fermî dikir. Lê xuya dike ku, her gava ber bi diyalogên ji bo yekîtiyê ve were avêtin, dijmin bi tevayiya hêza xwe bi riya PDKê rê li ber digire."

**"Gelê Kurd tev yek e, lê dijmin wan parçe dike"**

Rohat Xelîl da xuyakirin ku divê gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê ji bo yekîtî û azadiyê tev bigere. Lewra ziman, civak, dîrok, çand û hunera me yek e û axaftina xwe wiha domand. "Gelek komkujî, êş û derd li ser gelê Kurd re derbas bûne. Bila xelkê me baş bizanin ku, armanca dijmin mirovê Kurd e, ne partî û rêxistin in. Ji ber ku em Partiya Yekîtiya Demokratîk , li dijî êrişên li ser Başûr disekinin, em rastî êrişan tên. Helwesta me diyar e û em ne bi şerê birakujiyê re ne. Her tim banga me ji bo partiyên azadîxwez ew e ku, li hemberî dijminê ku dixweze gelê me tine bike, helwesta xwe diyar bikin û ji bo berjewendiyên gelê Kurd bixebitin."

**"Hişyar bin, hebûn û tinebûn di planê de ye"**

Rohat Mele Xelîl da zanin ku, ji bo diyalogên kurdî deriyê wan her tim vekirî ye, lê sedema seknandina aliyê din çi ye, ew jî nizane û axfaftina xwe wiha domand: "Di şerê herî giran de ji bo aştiyê diyalog çêdibin. Lewra aştî bi diyalogan çêdibe. Ti carî bi şer û girtina nûneran pirsgirêk nehatine çareserkirin. Ji bo ku gelê me yê li her çar parçeyan nebe qurbana berjewendiyên siyasî, herwiha tişta ku me ji dijmin biparêze, avakirina yekîtiyê ye."

Hevseroka Ofîsa Têkiliyên Doblomasî ya PYD`ê Rohat Mele Xelîl di dawiya axaftina xwe de careke din bang li partî, gel û hikûmeta Başûr kir ku, li dijî binpkêkirina mafê mirova ku li ser xaka Kurdistanê tê kirin, bêdeng nemînin û divê helwesta xwe diyar bikin. Lewra hebûn û tinebûna gelê Kurd di plana dijimin de ye.

## Rêgeza welatparêziyê

**Zehra TUNÇ**

Rêgeza bingehî ya bîrdoziya tevgera jina azad ya li Kurdistanê her ku diçe bi çalakî û kêrhatinên xwe mezin dibe û tirsê dixe dilê zordaran, welatparêzî ye. Li gorî wan welatparêzî berî her tiştî ye û xala herî bingehî ya xwebûnê ye. Jixwe Zeyneb Kinaci bi nasnav Zîlan ku bi çalakiya xwe bûye pêşenga jinên Kurd ku hefteyek e li çar aliyên Kurdistanê û her dera Kurd lê dijîn tê bîranîn jî di bingehê lêhûrbûna xwe de balê dikişîne ser welatparêziyê û wek xala bingehî ya têkoşînê nîşan dide.

Di vê pêvajoyê de jî li qada Zap, Metîna û Ava Şîn yên şer lê giran e gerilayên YJA Starê yên di xeta Zîlanê de rêgeza welatparêziyê ji bo xwe bingeh girtine jî heta nefesa xwe ya dawiyê li hemberî dagîrkeran şer dikin. Di bin fermandariya Cîhan Kapar bi nasnav Amara Cûdî de jî li eniya Aris Faris ya Herêma Ava Şîn ev şênber hat dîtin. Fermandar Amara û sê jinên milîtan yên pê re, bi hev re soza serkeftinê dan û sê rojan bênavber li hemberî bi hezaran leşkeran şer kirin. Dawiyê êrîşkarên nesîbê xwe ji mirovayiyê negirtîn û tevayiya rêgezên şer binpê dikin li hemberî wan jinên çeleng neçar man gazên kîmyayî bi kar anîn. Bi wî awayî her çar jinên fedayî yên di xeta azadiya jinê, civaka ekolojik û demokratîk de bûn alaya Zîlanê dewrî hevalên xwe kirin û tevlî stêrkên bêdawiyê yên her dem geş dimînin bûn.

Jinên bi pêşengiya fermandarên di xeta Zîlan de bi rêgezên jina azad re bûne yek bi biriyardariyeke mezin di nava refên YJA Starê de li hemberî dagîrkeran şer dikin û çalakiyên bibandor li dar dixin. Her roj taktîk û rêbazên nû derdixin û bi hêzeke mezin bi ser dagîrkeran de diçin. Salvegera 25. ya fermandara xwe ya fedayî Zîlan jî bi çalakiyên bibandor bîr anîn. Ev giyanê ji pola yê li lûtkeyên Zagrosan dijî wê tola jinên di binê siya şeran de tên hedefgirtin û qetilkirin bê hilanîn. Ew nahêlin êdî jin bê nav û nîşan li goristanên bêkesan bên veşartin.

Di helwest û berxwedana giştî ya Kurdan ya li hemberî dagîrkeriyê derketiye pêş de jî diyar dibe ka asta welatparêziyê di kîjan radeyê de ye. Derveyî qismek deshilatdar yên despêkê xwe paşê jî axa xwe firotine derve helwesta tevayiya gelê Kurd welatparêzî, jidil û zelal e. Ev rojane tê nîşandan. Ji bo pêşî li dagîrkeriyê bê girtin pêwîstî bi helwesteke zêdetir bihêz heye. Ji ber di ferqa wê de ne li hemberî êrîşên mêtîngeriya axê û xirakirina hoyê civakê, pê re jî jinê hedef digirin. Her cihê êriş û mêtîngerî lê hebe kuştinên jinan jî zêde dibe û ev bi zanebûn tê kirin. Ji bo pêşîgirtina li van hemûyan pêdivî bi hêzkirina rêgeza welatparêziyê heye. Bi rêgeza welatparêziyê re pergala azadiya jinê, civaka ekolojîk û demokratîk pêkan e û ev li Kurdistanê her ku diçe zêdetir pêk tê. Ev hê zêdetir bi awayekî şênber azadiya jinê û bihêzkirina vîna civakê nîşan dide û pê re jî dibe tirsa deshilata heyî ya her dem xwe bi şêwazeke cuda bi ser civakê de disepîne.

# Gedo: Armanca ENKSê reşkirina Rêveberiya Xweser e

**Sekreterê giştî yê Partiya Çep ya Demokratîk ya Sûriyê Salih Gedo, daxuyaniyên ENKS`ê yên li dijî Rêveberiya Xweser wek "dijminane" bi nav kirin. Herwiha diyar kir ku armanca sereke ya wan daxuyaniyan reşkirina Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ye.**

Li hemberî êrişên domdar ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser ên ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve, Encûmena Nîştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) dem bi dem hewl dide bi hemû rêbazan Rêveberiya Xweser reş bike. Di vê dawiyê de asta daxuyaniyên wê yên dijminane yên li dijî doza Kurd û Rêveberiya Xweser zêde bûn.

Berpirsên ENKS`ê hema bêje rojane li ser ragihandinê daxuyaniyan didin û Rêveberiya Xweser reş dikin ku şêniyên herêmê bi saya xwîna şehîdan ew rêveberî ava kir.

Sekreterê giştî yê Partiya Çep a Demokratîk a Sûriyê Salih Gedo destnîşan kir ku daxuyaniyên ENKS`ê îsbat dikin ku ew di nava aloziyeke hundirîn de ye û beşek ji wan alîgirên dewleta Tirk in. Gedo wiha domand: "Ez di wê baweriyê de me ku beşek ji ENKS`ê li dijî van daxuyaniyan e ku bi navê wê li dijî Rêveberiya Xweser derdikevin."



**DAXUYANIYÊN DIJMINANE**

Gedo daxuyaniyên ENSK`ê yên li dijî Rêveberiya Xweser bi "dijminane" wesifandin û got: "Ev daxuyanî mîna yên Çavuşoglu û çeteyên DAIŞ`ê yên li dijî Kurdan in. Armanca sereke jî reşkirina Rêveberiya Xweser û şoreşa Rojava ye."

Gedo piştrast kir ku divê gelê Kurd û tevgera siyasî ya kurdî helwesteke redker li hemberî van daxuyaniyan nîşan bidin û wiha berdewam kir: "Gelê Kurd van daxuyaniyan qebûl nake. Ji bo me parastina gel û peydakirina ewlehiyê girîngtir e. Ji ber ku gelê me dê bersiva daxuyaniyên aliyên dijberî Rojava bide."

Her wiha Gedo bal kişand ser daxuyaniya serokê Îtîlafa Sûriyê Nasir El-Herîrî û got: "ENKS beşeke Îtîlafê ye, El-Herîrî jî serokê wê ye. Yanî El-Herîrî serokê ENKS`ê ye. Ev daxuyaniyên wê tenê xizmeta berjewendiyên dewleta Tirk, DAIŞ û Cebhet El-Nusra dikin."

Serokê Îtîlafê Nasir El-Herîrî bang li dewleta Tirk kiribû ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet Minbic û Til Rifetê dagir bike

**`DAXUYANIYÊN ENKS`Ê JI DAXUYANIYÊN EL-HERÎRÎ XIRABTIR IN`**

Gedo wiha domand: "Daxuyaniyên ENKS`ê ji daxuyaniyên El-Herîrî xirabtir in. Diviyabû ku ENKS li ser bingeha rihê welatparêziyê bersiva daxuyaniya El-Herîrî bida. Gelo ji mîna van daxuyaniyên li dijî gelê xwe yê li Rojava şerm nake ku li şûna wê me jê hêvî dikir ku ji Îtîlafê vekişe?"

Gedo bal kişand ser destkeftiyên ku Rêveberiya Xweser û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bi dest xistine û got: "Bi saya fedakariyên QSD û berxwedana wê gelê me ji gelek komkujî û sûcan xilas bû ku li bajarên din ên Sûriyê pêk hatine. Ji ber wê divê em piştgiriya wê bikin."

Sekreterê giştî yê Partiya Çep a Demokratîk a Sûriyê Salih Gedo bang li ENKS`ê kir û got: "Hûn beşek ji tevgera siyasî ya kurdî ne û nûnertiya beşekê dikin. Lewra divê hûn li aliyê parastina Kurdan bin û li rex dijminan nesekinin. Ji bo ku di pêşeroja Sûriyê û çareseriya aloziya wê de Kurd cih bigirin divê helwesteke wiha nîşan nedin."

*ANHA*

# Şervan Derwêş: Banga Itîlafî banga bêrûmetiyê ye

**Navanda Nûçeyan/Qamişlo**

Şervan Derwêş diyar kir ku Itîlafa Sûriyê bûye ajanek ku berjewnediyên gelê Sûriyê têk dibe û got, ew çete ne û li gorî ajandeyên dewleta tirkî kar dikin. Minbic, careke din bi bangewaziya serokê Itîlafê Nasir El-Herîrî ya ji bo serokkomarê Tikiyê Recep Tayyîp Erdogan ku bajêr dagîr bike, ket rojevê. Berdevkê fermî yê Meclisa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwêş di hevpeyvîneke li gel ajansa nûçeyan ANHA de diyar kir ku ji dema rizgarbûna Minbicê ve gelek alî û herî zêde jî dewleta tirkî hewl didin vî bajarî dagîr bikin. Ji bo wê jî gelek rêbaz bi kar anîn.

Hevpeyvîn wiha ye:



**Gelo piştî vekişîna Emerîka ji Minbicê çi bû û niha kî Minbicê diparêze?**

Niha hêza çalak ku Minbicê diparêze Meclisa Leşkerî ya Minbicê ye. Lê ji ber geşedanên dawiyê, bi taybet piştî vekişîna hêzên Emerîka û Koalisyona Navneteweyî ku di şerê rizgarkirina bajêr de bi me re bûn, lihevkirineke leşkerî çêbû û li gorî wê hêzên hikumeta Şamê li eniyên şer li rex hêzên me belav bûn. Herwiha Rûsya navendeke koordîneyê jî vekir. Eniyên Minbicê ji bakur, heta bakur-rojava eniyên şer yên bi çeteyên dewleta tirkî û artêşa tirkî ya dagşrker re ne. Gelek baregehên dewleta tirkî ya dagîrker lê hene. Ji rojava heta başûr eniyên bi hêzên hikumeta Şamê re hene. Heta niha li wir ti şer derneketine. Ji destpêka rizgarkirinê heta niha her tim çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker herêmê topbaran dikin û di vê dawiyê de topbaran zêde bûye.

**Gelo girîngiya Minbicê ji bo dewleta tirkî, Rûsya û hikumeta Şamê çi ye?**

Helbet Minbic di gelek aliyên leşkerî de xwediya girîngiyeke stratejîk e. Dergehê Helebê ye, li ser riya navneteweyî ye û bûye navenda eniyên şer yên di navbera gelek aliyên xwediyên ajandeyên cuda de. Her kes hewl didin Minbicê bixe destê xwe da ku hegamonyaya xwe xurttir bike. Navendeke bazirganî û depoyeke mirovî ya mezin e. Ji ber van egeran Minbic ji bo her kesî girîng e. Digel ku aliyê Rûs garantorê lihevkirinê bû, lê ew jî hewl dide berjewendiyên hikumeta Şamê pêk bîne. Lewra di vê sponsoriyê de wek aliyekî garantor ne durist e. Rûsya binpêkirin û topbarankirina jîngehan ji aliyê dewleta tirkî ve, paşguh dike. Rûsya rê li pêşiya êrişên ser Minbicê û xelkê wê nagire.

**Gelo hûn daxuyaniyên dawî yên Itîlafê çawa dinirxînin ku bang li dewleta tirkî kir ku Minbicê dagîr bike?**

Bawerî bi Itîlafê nayê. Bûye ajanek ku berjewendiyên gelê Sûriyê têk dibe. Ew çete ne û li gorî ajandeyên dewleta tirkî kar dikin. Beramberî ajantiyê pereyan digirin. Hemû vê rastiyê dizanin. Ez ne bawer im ku bandora wan hebe. Gelê Sûriyê bi giştî wan red dike. Yên bang li dewletekê dikin ku welatê wan dagîr bike, ji bilî bûrûmetiyê mirov nikare wan bi nav bike. Di warê siyasî de jî bi çetetî û ajantiyê tên naskirin.

*Çavkanî-ANHA*

## Ji nêz ve

### Dema ku wijndan nebe; HSD û Hevpeymaniya li dijî DAIŞê -1-

**Ednan Muştafa**

Di çarçoveya hevkariya di navbera hêza sereke ya şerê DAIŞê dikin li ser erdê û Emerîka wek serkêşa hêzên hevpeyman, pêwîst bû hê zêde kordînasyoneke kar û xebatê derketa pêş. Ev koodînesyona kar, ne di warê leşkerî û pişgiriya HSD'ê tenê de, herwiha di warê siyasî û civakî de jî pêwîst e. Lewra dema mirov di vê çaroveyê de li hevalbendiya Hevpeymana Navneteweyî ya şerê li dijî DAİŞ û HSD'ê temaşe dike, bi awayekî berbiçav qusûr û kêmayiyeke mezin ya hêzên hevpeyaman heye.

Hê di ser encamnameya civîna NATO ya li Brûkselê re 15 roj derbas nebûne, 28ê Hezîranê, li paytexta Îtaliya Roma welatên 'Hevpeymaniya li Dijî DAİŞê civîna xwe ya asayî li dar xistin. Bêguman gelek mijarên ku di vê civînê de hatine nîqaşkirin hene. Lê ya balkêş ev civîn bi qasî taybet ji bo Sûrî hatibû lidarxistin, ne vexwendina Fermandariya QSD'ê ku wek şirîka herî sereke ya şerê DAİŞ bi hevpeymaniya navneteweyî cihê mixabinî û şermezarkirinê ye.

Sala 2014an, piştî ku berxwedaneke bêhempa ya şervanên YPG û YPJ'ê li Kobanêya berxwedêr li dijî hovîtiya DAIŞê nîşan dan, di serî de Emerîka tevayiya welatên ku di nava NATO de, bi matmayînê encamên şer dişopandin û li ser lehengiya şervanên Kurd YPG û YPJ'ê bi serkêşiya Emerîka NATO mecbûr man ku bi navê 'HEVPEYMANİYA ŞERÊ Lİ DİJÎ DAIŞ' bikevin nava tevgerê û piştgirî dan YPG'ê û di encamên de Kobanê ji Tarîtiya DAIŞê rizgar kirin. Ev pêngav bû wesîleyek û gavbigav di navbera hêzên kurdî YPG û YPJ'ê de hevkarî zêde bibe. Di encama vê hevkariyê de, li ser esasê hêza sereke ya YPG û YPJ'ê bi navê Fermandariyeke nû artêşbûna HSD'ê 'HÊZA SÛRİYA DEMOKRATÎK' hat avakirin. Li ser bingehê şerê li dijî DAIŞê, HSD'ê û hêzên hevpeyman bi serkêşiya Emerîka bajar û bajarokên di binê desthiladariya DAIŞ'ê de hatin rizgarkirin. Bi taybetî piştî rizgarkirina Bendava Tişrîn, Minbic, Tebqa, Reqa û herî dawiyê gundewarê Dêrazorê bi rizgarkirina Baxozê dawî li DAIŞ'ê hat. Bi dawîhatina hemleya li Baxozê û tinekirina DAIŞê, di navbera pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûrî de qonaxeke nû ya siyasî li ser bingehê pêşixstina Neteweya Demokratîk dest pê kir û hê girîngî hat dayîn ji bo sazkirina Meclîsên gel yên medenî û avakirina fermandariyên Meclîsên Leşkerî qonaxa rizgarikirina bakur û rojhilatê Sûrî ji DAİŞê temam kir. ***Didome.....***



# Divê li her deverê berxwedan û serhildan çêbin

**Dewleta tirkî li ser rêber Abdullah Ocalan tecrîdeke giran dimeşîne û derfetê nade ku parêzer û malbata wî hevdîtinê pê re bikin. Têkildarî mijarê Endamê Yekîtiya Rewşenbîran ya herêma Cizîrê Ebûd Meqsû nêrînên xwe ji rojnameya me re rave kirin.**

**Navanda Nûçeyan/Qamişlo**

Endamê Yekîtiya Rewşenbîran ya herêma Cizîrê Ebûd Meqsû di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser berxwedana zindanan û wiha got: "Berxwedana li zindanan ne berxwedaneke nû ye, kok û bingehê wê di sala 1980`yan de dest pê kiriye. Bi wê berxwedanê ji mirinê jiyan ava kirin. Ji ber wê îro jî ev berxwedan berdewam e. Dema em dibêjin 'Dem Dema Azadiyê ye" îro jî bi pêşengiya Leyla Guven bi hezeran girtî berxwedanê bi rê ve dibin, ku dîroka wê jî vedigere berxwedana Mazlûm Dogan, Hayrî, Akîf û Sakîneyan û ji mirinê jiyan tê avakirin.

Ebûd herwiha bang kir ku her kes dengê berxwedana li zîndanên Tirkiyê bihize û ji bo bigihe armanca xwe pişgiriyê bidinê û axaftina xwe wiha domand: "Li hemberî dorpêç û tecrîda li zindanan, bi teybetî jî ya li Îmralî, derveyî tekoşîna azadiyê û berxwedanê ti riyên me yên din nînin. Divê gel, tevayiya partiyan, saziyên civaka sivîl, nivîskar û rewşenbîr piştgiriya berxwedana li zîndana bikin ku armanca wê azadiya rêber Apo ye pêk were. Parêzer jî divê bi riya qanûnê dengê xwe bigihînin saziyên mafên mirovan yên cihanê; hunermend bi stêranan dengê vê berxwedanê bigihînin dinyayê. Tenê bi van rengan dikarin beşekî ji mafê berxwedana wan bi cih bînin."

Girêdayî tecrîda giran Ebûd Meqsû teqez kir ku tecrîda li ser rêber Apo tecrîda li ser gelan e. Herwiha da zanîn ku divê derdorên demokrat û gelê Kurd bigihin hev û têkoşîna azadiya Rêber Apo xurt bikin. Lewra heta azadiya rêberê Abdullah Ocalan pêk neyê azadiya ti gelan pêk nayê.

Ebûd Meqsû di dawiya axiftina xwe de banga yêkîtiya Kurdan kir û got, em wek Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê bang li tevayiya nivîskar, rewşenbîr, hunermend û hiqûqnasan dikin ku dengê xwe bilind bikin û bêjin ji işkence û tecrîda li zindanan re na, ji binpêkirina mafan re na, ji xiyanetê re na, ji azadî û yêkîtiyê re erê, ji biratiyê re erê, ji demokrasiyê re erê.



# "Heta kengê wê hêzên navneteweyî bêdeng bin?"

**Hediya HISÊN/Qamişlo**

**Enwer Mûslim derheqê êrişên tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûrî de axivî û got, armanca dewleta tirkî ya dagîrker diyar e; naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe. Ji ber wê her dem gefan li sînorê Sûriyê, bi taybetî herêmên bakur û rojhilatê Sûrî dixwe.**



Hevserokê PYDê Enwer Mûslim diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, çete û penaberên Sûriyê yên li Tirkiyê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne û hewl dide perçeyên din ji bakur û rojhilatî Sûrî dagîr bike.

Mûslim bal kişand ser gefên Tirkiyê yên li bakur û rojhilatê Sûrî, bi taybetî yên ser Êyn Îsa û Şehba û axaftina xwe wiha domand: "Tecrûbeya Rêvberiya Xweser ya demokratîk li Rojhilata Navî tecrûbeya yekê ye û serkeftî ye. Tecrûbeya pêkhateyên rojavayê Kurdistanê ye ku xwe bixwe bi rê ve dibin û tecrûbeya 10 salan ya têkoşîn û serkeftinê ye. Ji ber wê dewleta tirkî vê tecrûbeyê xeter dibîne û li kêleka xwe ti carî aramiyê naxwaze. Herwiha naxwaze rêveberiyeke demokratîk bi destê Kurdan li sînorê wê hebe. Ji ber wê êriş dike û sivîlan dike hedef. Bi taybetî Êyn îsa dike dike hedef. Lewra Êyn Îsa cihekî girîng e û navendeke Rêvberiya Xweser e. Herêmên Sûriyê bi hev ve girê dide û li ser xeta M4 e. Ji ber wê Tirkiye dixwaze vê herêmê ji aliyê siyasî û aborî ve bifetisîne. Herwiha ji bo ku hêviya gelê Efrînê ya vegerê bişkîne, Şehba dagîr bike û berê xwe bide Helebê, gefan li Şehba jî dixwe."

Mûslim bang li hêzên navneteweyî kir û got, divê hêzên navneteweyî sînorekî ji kiryarên dewleta tirkî ya faşîst û çeteyê wê re deynin û berjewendiyên gelên Sûrî li ber çavan bigirin. Peymana di navbera Tirkiye û Emrerîka ya sala 2018an de çêbûyî -ku divê Tirkiye derbasî erdê Sûrî nebe- ji aliyê Tirkiyê ve tê binpêkirin û gefên xwe didomîne. Em bi hêvî ne ku hêzên koalisyonê parastina Sûriyê ji dagîrkeran bikin û piştgiriyê bidin hêzên Sûriya Demokrat.

Tevî zehmetiyan gel xwedîvîn e Enwer Mûslim bal kişand ser berxwedana gel û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Gelê me yê bakur û rojhilatê Sûrî bi giştî di wê baweriyê de ye ku Tirkiye dixwaze bajarên din jî dagîr bike. Ji ber wê gelê me bi çalakiyên xwe dide xuyakirin ku Tirkiye terorîst e. Gelê bakur û rojhilatê sûrî xwediyê mîraseke mezin e, bi dehê salan e ji bo azadî û dîmokrasiyê têkoşînê dike. Nêzî 11 hezar şehîd hatine dayîn û 22 hezar birîndar hene. Erê temenê vê tecrûbeyê 7 sal in lê gel nîşan da ku dikare xwe biparêze. Bi hêvî me ku gelê Sûrî bi giştî destekê bidin Rêvberiya Xweser, Sûrî biparêzên û ji bo Sûriyeke nenavendî û demokratîk em bi hev re têkoşînê bikin."

# KCKê Şêx Seîd û hevriyên wî bîr anîn



**Navenda Nûçeyan**

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê, diyar kir ku Şêx Seîd û 47 rûspiyên Kurd li ber sêdarê helwesteke birûmet nîşan dane. Li ber sêdarê gotibûn, wê zarok û neviyên me ala têkoşînê rakin û bigihînin serketinê.

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê têkildarî salvegera darvekirina Şêx Seîd û 47 hevriyên wî daxuyaniyeke nivîskî da.

Daxuyaniyê wiha dest pê kir: "Ji sala 1925'an ve ku bi dehhezaran Kurdan şehîd dane, ti hêz nikarin vîna Kurdistanê bişkînin. Îro ruhê azadiyê yê li her dervera Kurdistanê digere, ruhê Kurdê azad e.Vî ruhî doh jî li ber xwe dabû, îro jî li ber xwe dide, wê sibe jî li ber xwe bide. Keç û xortên gelê Kurd wê bi dehhezaran şehîdên xwe ji bîr nekin. Wê mîna wan bibin fedayiyên gelê Kurd. Îro yên li Zap, Avaşîn û Metîna li ber xwe didin, hemû keç û xortên Kurdistanê ne."

Daxuyaniyê wiha wiha dewam kir: "Berî 96 salan Şêx Seîd û 47 hevrêyên wî li Qada Dagkapi ya Amedê hatin darvekirin. Em van rûspiyên Kurd yên ji bo azadiya Kurdistanê xwe feda kirîn bi minet bîr tînin. Emê qîrîna wan ya li ber sêdarê, hesreta Kurdistana azad ya emanetî me ewladên xwe kirîn, teqez pêk bînin.

Rêber Apo diyar dike ku polîtkayên qirkirina Kurdan sala 1925'an dest pê kiriye. Ji wê rojê ve dewleta tirkî ya mêtîngerqirker li ser gelê Kurd polîtîkaya qirkirinê dimeşîne. Polîtîkaya qirkirinê ya sala 1925'an des tpê kirî, îro dorfirehtir û berbelavtir bûye. Her çendî zor û zehmetî hebin jî, dema têkoşîn bê kirin, em ji her demê pirtir nêzîkî hesreta Kurdistana azad ya Şêx Seîd û hevrêyên wî ne.

**KEÇ Û XORTÊN KURD JI BO ŞÊX SEÎD, SEYÎD RIZA Û TEVAYIYA ŞEHÎDAN LI BER XWE DIDIN**

Şêx Seîd û 47 rûspiyên Kurd li ber sêdarê helwesteke birûmet nîşan dane û gotine, wê zarok û neviyên me ala têkoşînê bilind bikin û bi ser bikivin. Bi dehê salan e keç û xortên Kurd di têkoşîna li dijî mêtîngerî û qikirinê de nûnertiya wê helwesta li ber sêdarê dikin. Êdî hesreta Kurdistana azad ya Şêx Seîd û Seyîd Riza li her çiya, gelî û bajarî pêk tê.

Ti hêz nikare vîna Kurdistanê bişkînin. Îro ruhê azadiyê yê li her dervera Kurdistanê digere, ruhê Kurdê azad e. Vî ruhî doh jî li ber xwe dabû, îro jî li ber xwe dide, wê sibe jî li ber xwe bide. Keç û xortên gelê Kurd wê bi dehhezaran şehîdên xwe ji bîr nekin. Wê mîna wan bibin fedayiyên gelê Kurd. Îro yên li Zap, Avaşîn û Metîna li ber xwe didin, hemû keç û xortên Kurdistanê ne.

Roja Şêx Seîd û 47 hevriyên wî hatîn darvekirin, ji bo Rêber Apo jî biryara darvekirinê hat dayîn. Mêtîngerên qirker peyama ku qedera we ev e dan. Em jî qedera ji bo me hatî danîn pûç bikin û Kurdistaneke azad û demokratîk ava bikin. Pîrozbayiya vê ya herî mezin jî emê li Qada Darkapi ya Amedê pêk bînin."

***ANF***

## Neviyên Şêx Seîd



**Faruk SAKİK**

Şêx Seîdê Pîran, berî ku were darvekirin wiha gotibû: "Ez niha li ser vê dinyaya fanî li ber xatirxwestinê me. Ez ne poşman im ku ji bo vî gelî feda bûme. Bes ku neviyên min, min li hemberî neyarên min nedin şermê.

Di ser vê wesiyeta wî re sal û dem derbas bûn. Gelek neviyên wî ji bo ku wî nedin şermê xebat meşandin.

Li hemberî dijminên Kurdan yên hov carna bi ser nediketin. Di sala 1978'an de bi navê Abdullah Ocalan kesek derket ji bo ku tola Şêx Seîd hilîne û wî li hemberî dijmin nede şermê, dest bi têkoşînê kir. 43 sal in bênavber li hemberî dijminên Kurdistanê şer dike. Kurdan jî bi wî bawerî anî ku wê tolê tevayiya şehîdên Kurdistanê ev tevger bistîne û Kurdistanê azad bike. Bi ser ket jî. Gelek destkeftiyên mezin bi dest xistin. Kurdistan ber bi azadbûnê ve diçû. Lê dijminnên Kurdan û Kurdistan jî vala nedisekinîn. Çi anîbûn serê Şêx Seîd dixwestin bînin serê Rêber Apo jî. Di qada navneteweyî de komployek dan destpêkirin û bi ser neketin. Ocalan li aliyekî ji bo komployê bêbandor bike, li aliyekî jî ji bo yekîtiyê ava bike têdikoşiya. Ev xebata wî ya yekîtiyê xeyala Şêx Seîd bû jî. Di sala 2013'an de ev xebata yekîtiya neteweyî hat asteke wisa ku ew fotografê li Hewlêrê hêviyek mezin dabû Kurdan. Lê dijminan êrişî vî fotografî kir. Û ji wê hêviyê, fotografek tenê di arşîvan de ma.

Ji bo Şêx Seîd nedin şermê û ev yekîtî pêk were, neviyên wî li Herêmên Parastinê yên Medyayê li dijî dagîrkeran şer dikirin. Di vî şerî de dijmin li hemberî Kurdan dema serkeftinek nedît, serî li planeke nû da. Di vê planê de wê ji wan neviyên Şêx Seîd hin bigirtan cem xwe û şerê Kurd û Kurdan bida destpêkirin.

Ew neviyên Şêx Seîd ku şer dikin ji bo pêşî li vê plana dijmin bigirin bangî Kurdan kirin ku bibin asteng. Ev bang ji aliyê gelek kesên xwedîwijdan ve hat bihîstin û ketin nava hewldanan. Heyet biheyet derbasî Hewlêrê bûn. Şêx Seîd dema ku li dijî dewleta tirkî ya dagîrker şer da destpêkirin, ji her deverê serokeşîr û navdarên Kurdan berê xwe dan vê serhildanê. Dijmin wê rojê jî dîsa li dû plana ku îroj pêk tîne bû. Hin eşîr û malbat girtibûn cem xwe û li dijî serhildêran didan şerkirin. Vê bala Şêx Seîd jî kişandibû û ji bo pêşî lê bigire ji bo wî dereng bû. Hatibû girtin û rojên wî yên dawî bûn. Ji bo vê jî di wesiyeta xwe da digot, yekîtiya xwe pêk bînin û min nedin şermê.

Dîsa sed mixabin hin alî wî didin şermê û bi dijmin re tev digerin. Bi vê hevkariya xwe jî dibin sedema metirsiya şerê Kurd û Kurdan. Ev şer di heman demê de dibe ku bibe sedema tinekirina serhildana dawî jî. Lê em baş dizanin ku wê ti plan nikaribin vê serhildana dawî tine bikin. Em baş dizanin ev tevgera dawî ji serhildanên berê dersên mezin girtine. Ji bo ku tine nebe û lîstikên dijmin xeab bie têdikoşe.

Lê dive em neviyên Şex Saîd ji bo ku wan neviyên li kêleka dijmin cî girtine ji şaşîtiya wan vegerînin, heyet li ser heyetan bişînin Hewlêrê. Ev heyet bila gotinên Şêx Seîd yên dawî "Bila neviyên min, min li hemberî neyarên min nedin şermê" bîra wan bixin.